## Em sebaret bi xwe

Indigo Navenda Rawêjkariya Gelemperî ya Jinan û Navenda Rawêjkariya Pisporî ya dijî Şideta Zayendî ya „SkF e.V. Bergisch Land“ li Remscheid’ê ye.

Em rawêjkariyê raberî hemî jin* û keçên* mezintir ji 16 salî û xizmên wan di warê şideta zayendî û navmalî û mijarên din ên taybetî jinan dikin. Em di rawêjkariya kesane de bi hev re rêyên derketina ji qeyranê dîzayn dikin û bijardeyên tevgeriyanê yên cûrbicûr, heta di rewşekê da ku şideta serpêhatî vedigere demên dirêjtir ên di raboriyê da, nîşan didin.

Em xwedan nêrîna femînîstî û alîgirane li ser xêr û berjewendiya jin* û keçan* in.

## Rawêjkariya me

- belaş e
- Eger were daxwazkirin, bi awayê nenas e
- Di bin pêwîstiya nihênîbûnê de ye
- Serbixwe ji kok û etnîk, ol û şêwaza jiy anê ye
- Di rewşa nenasyarbûna digel zimanê Almanî bi wergêrekî devkî pêkan e

* Mebesta me ji jin û keçan hemî kesan digire ber xwe ku pênaseya xwe wek jin û keç didin nasandin.

## Hûrgilî û Têkilîdanîn


**Navenda Rawêjkariya Jinan a Indigo‘yê li Ramscheid‘ê**
Sozialdienst katholischer Frauen e.V. Bergisch Land (Lijneya tomarbûyî ya xizmetên civakî yên jinên katolîk aBergisch Land‘ê)

Theodorstr. 8
42853 Remscheid
Telefon: 02191 – 69660-0
Email: indigo.fachberatung@skf-bergischland.de


**Derfeta destragihiştina telefonî**
Duşemî heta Pêncşemiyê: Saet 9:00 – 16:00 û Îniyê: Saet 9:00 – 14:00

Eger me bersiva telefonê neda, tu dikarî bi hêsanî li ser amûra peyamgir ji bo me peyamekê bihêlî. Piştî wê em ê digel te têkilî dayînin.

Navenda Rawêjkariyê bi rêya Sêpilekanê dikare were gihiştin. Destava bêberbend ji bo hatûçûna kesên astengdar heye. Eger hewce be, dibe ku cihên bi berbendên hindik werin organîzekirin.

Destragihiştina bo**Rawêjkariya Serhêl** a me li vir dibînî:

Li gor daxwazê, ji bilî vêya derfeta **Rawêjkariyeke Vîdyoyî** heye.


Piştgirîbûyî ji aliyê:

**Ministerium für Kinder, Jugend, Familie, Gleichstellung, Flucht und Integration des Landes Nordrhein-Westfalen**





# Navenda Rawêjkariya Jinan a Ramscheid‘ê


Sozialdienst katholischer Frauen e.V.
Bergisch Land

SkF

## Rawêjkarî di warê şideta zayendî û navmalî

**Şideta zayendî** dibe ku bi rengên cihêwaz biqewime. Ev şidet û tundûtûjî dibe ku ji aziradina zayendî wek mînak gotinên pîs an jî pelandin û destlêdanên bêyî rezamendiyê heta neçêbikaranîna zayendî yan jî destdirêjiya zayendî anku seksual bigire ber xwe.

Di tevahiya van şekl û awayan de mafê biryardanê di warê zayendî de bi giranî dihê binpêkirin.

**Şideta Navmalî** pirranî di têkiliyên navbera cothevjînan de diqewime ku niha di têkiliyê de ne, di rewşa hilweşiyanê de ne yan jî pêştir têkiliya wan hilweşiyaye. Ev şidet dikare hemî cûreyên şideta fîzîkî, derûnî û zayendî, wek mînak bêrêzîkirin, gefxwarin, kontrolkirin, yan heta kotek û lêdanê bigire ber xwe.

Gelo tu yan kesek ji derdorên te tûşî şideta navmalê yan şideta zayendî bûye? Gelo tu nizanî ku çawa divê pê re rûbirû bibî yan dikare mijarê digel çi kesî parve bikî?

**Em li kêleka te ne û di warên xwarê de rawêjkariyê raberî te dikin:**

- Piştî şideta zayendî û navmalî
- Têkildarî destwerdanê li gorî Qanûna Parastina li dijî Şidetê
- Têkildarî pirsîna li ser ragihandina sûc
- Ji bo pêkanîna aramî û seqamê di dema stres û behicîna rûhî
- ...

## Rawêjkariya Taybet a Jinan

Gelo tu di rewşeke jiyanê ya dijwar de yî? Gelo tu êdî nizanî ku di dewamê de divê çi bikî û te ev hest heye ku ti rêkarekê peyda nakî? Gelo nerazîbûna te zêdetir dibe? Carinan dibe ku piştevanî û hevrêtiyeke profesyonel ji bo darêştina rêkarên nû ji bo xwe bimifa be.

**Em di warên xwarê de Rawêjkariya Derûnî-Civakî raber dikin:**

- Di qeyranan, qonaxên derbasdêr û guherînên jiyanê
- Têkildarî pirsgirêkan di şixulînê, têkildarî te yan li nav malbatê
- Têkildarî mijarên pênaseya kesane
- Têkildarî alîgiriya zayendî û aşkirakirina alîgiriya zayendî
- ...

Heta di rewşekê da ku piştrast nînî ku gelo serdana te ya me digel xwesteka te durist e yan na, dikarî bi daxwaz û meyla xwe serdana me bikî.

## Xizmetên komî

Têkildarî mijarên cihêwaz li gorî hewceyîyê, di rewşa meyla dilî de ji me bipirse.

## Xebata pêşîlêgirtinê û têkiliyên gelemperî

Em rûdanên ragihandin û axaftinên pisporî di babetên şideta zayendî û navmalî û mijarên din ên taybetî jinan ji bo karzan û weşînerên zanyariyan, kesên ziyandîtî û xizm û kesên wan, xwendevan û ... li dar dixin.

## Warê Parastina li dijî Şidetê ya me li Ramscheid'ê

**Sitargeh û serpenah di rewşa gef û şideta giran de:**
Mala jinan a Ramscheid'ê
Telefon: 02191 997016
Email: frauenhaus@skf-bergischland.de

Zanyariyên zêdetir li ser projeyên me di rûpela me ya sereke de dibînî
**www.skf-bergischland.de**



Foto: istockphoto.com | bazilfoto

## Yarmetî û alîkariya darayî

Eger dixwazî ku piştevanî ji xebata me bikî, em ê pê kêfxweş bibin. Jinan biwêrîne da ku di lêgerrîna alîkariyê ji bo xwe de bin û ku dilê te xwest zanyarî û hûrgiliyên me bide ber destê kesên din.
Em ji ber dewama xizmetên xwe ji alîkariya darayî yab te kêfxweş dibin.

**Bankverbindung:**
Stadtsparkasse Remscheid
IBAN: DE13 3405 0000 0012 1063 57
BIC: WELADEDRXXX

Bawernameyên alîkariya darayî dihêne derxistin.